## MÎHRÎCANA GOVENDA KURDÎ CARA 22'YEMÎN TÊ LIDARXISTIN

# Mîhrîcana govend û reqsê

**22'yemîn Mîhrîcana Govenda Kurdî îsal li Frankfûrtê tê lidarxistin. Mîhrîcana ku dê 31'ê gulanê dest pê bike ji bo hunermendê kurd Hidir Çelîk ku par di qezaya trafîkê de jiyana xwe ji dest dabû hatiye diyarîkirin**

**MÎHRÎCANA** Govenda Kurdî 21 sal berê cara yekemîn li bajarê Bonna Almanyayê hate lidarxistin. Mîhrîcana îsal li bajarê Frankfurtê di 30'ê gulanê de roja şemiyê saet di 17:00'an de bi meşa ku weke kevneşopî her sal pêk tê dê bê destpêkirin. Hemû komên beşdarî mîhrîcanê dibin dê cilên neteweyî li xwe bikin.

**SERLÊDANA** ji bo mîhrîcanê herî dawî heta 15'ê gulanê ye. Her wiha di mîhrîcanê de xelatên taybet jî dê bên dayîn. Ji bo komên ku kostumên xwe yên orjînal bi motîfên kurdî xemilandine dê xelata taybet bê dayîn. Xelateke din jî dê ji bo dosyayên lêkolînê yên der barê folklora kurdî de hatine amadekirin bê dayîn... RÛPEL - 6



## Li çiyê komeke şanoyê

Teatrapotamya ku bi pêşengiya hunermend Gafur Dogan û Erdogan Kahraman û gelek hunermendên din ku di Têkoşîna Azadiya Kurd de jiyana xwe ji dest dan, hate avakirin, 10 sal in xebatên xwe dimeşîne. Koma Teatrapotamya bi lîstikên nû sezona xwe ya şanoyê vekir... RÛPEL - 6

HAWAR
Rojnameya Rojane
13 Gulan 2009
Çarşem
Sal: 1
Hejmar: 8
Buha: 50 Kr


## Ji duh heta îro Cannes

■ Mîhrîcana Fîlman a Cannesê îsal salvegera xwe ya 62'emîn piroz dike. Mîhrîcan 61 sal in bê navber berdewam dike. Mîhrîcana Cannesê navê kurdan cara yekemîn bi Yilmaz Guney bihîst. Mîhrîcan her sal ji aliyê 40 hezar kesî ve tê temaşekirin... RÛPEL - 6



# 'Abdullah Gul rast got lê kêm vegot'

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk di civîna meclîsê de banga siyaset û zîhniyeta sivîl li hikûmetê kir û xwest ku sîstema cerdevaniyê jî bê rakirin. Turk gotinên Serokomar Abdullah Gul ên li ser pirsgirêka kurd jî erênî nirxandin. Çavdêrên siyasî dan zanîn ku Abdullah Gul rast gotiye û xwest projeyeke şênber bê amadekirin



### 'DIVÊ ÎRADEYA SIVÎL BÊ NÎŞANDAN'

Turk di civîna Koma DTP'ê ya Meclîsê de mijarên di rojevê de nirxandin. Turk, bal kişand ser girîngiya çareseriya pirsgirêka kurd û got ku komara tirk ji destpêkê heta niha çareseriya pirsgirêkê taloq dike, lê êdî dema çareseriyê hatiye. Turk wekî sedema neçareseriya heta niha jî, zîhniyeta rêveberiya tirk û kêmasiya îradeya sivîl nîşan da.

### 'PIRSGIRÊK TÊ QEBÛLKIRIN'

Turk, ji rêveberiya tirk xwest ku refleksa ji bo pirsgirêkên derve, ji bo pirsgirêka kurd jî nîşan bide û wiha got: "Êdî her kes qebûl dike ku pirsgirêka kurd, pirsgirêka bingehîn e. Heta ku Tirkiye vê pirsgirêkê û pirsgirêkên hundirîn çareser neke, wê nikaribe ji pirsgirêkên din jî rizgar bibe."Turk nîqaşên ji bo çareseriyê wekî gavên baş nirxandin.

### 'PROJEYÊN BERBIÇAV DIVÊN'

Turk, got ku Tirkiye di demên dawî de, ji bo çareserkirina pirsgirêkên bi cîranên xwe re dest bi hewldanan kiriye û got: "Her çiqas hê di pirsgirêkên Ermenistan û Kibrisê de çareseriyek pêk nehatibe jî, destpêkirina diyalogê tiştekî baş e û ji bo çareseriyê destpêkeke baş e." Turk ji hikûmetê xwest ku ji bo pirsgirêka kurd gavên pêwîst bavêje... RÛPEL - 4

## 'Daxuyanî rast in lê kêm in'

**Koma Civakên Kurdistanê der barê pirsgirêka kurd de daxuyaniyek da ANF'ê. Di daxuyaniyê de hate bibîranîn ku dewleta tirk ji destpêkê heta niha siyaseta înkar û tunekirinê dimeşîne û dixwaze gelê kurd bi temamî ji holê rake. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Gelê kurd bi pêşengiya Rêbertiya xwe, bi têkoşîna 36 salî ya têkoşîna azadiyê nîşan daye ku dê tu hêz nikaribe wî ji holê rake...** **RÛPEL - 4**



## Ji bo cenazeyê Ozturk astengî derxistin

Cenazeyê welatiyê bi navê Savaş Ozturk ku leşkeran kuştiye, piştî otopsiya li Nexweşxaneya Dewletê ya Wanê dema ber bi Elbakê ve derxistin rê rastî astengiya polîsan hat. Di navbera parlamenter Uçer û hêzên ewlekariyê de nîqaş derket. Ji bo veşartina cenazeyê Ozturk bi sedan kes li ber DTP'ê kom bûn. Her wiha li navçeyê jî dikan hatin girtin.



## Li navçeya Çelê operasyona leşkerî

Li navçeya Çelê ya Colemêrgê piştî mirina leşkerekî û birîndarbûna du leşkeran a di encama teqînekê de li herêmê operasyoneke leşkerî ya berfireh hate destpêkirin. Bi taybetî li derdora çoltera gundê Erîcanê operasyon berfireh dibe. Balafirên ji Colemêrgê rabûn jî ber bi herêma operasyonê ve firiyan.

## Ev aş bi gotinan nagere



Di nava çend rojan de rayedarên tirk li ser hev bi daxuyaniyên xwe bal kişandin ser pirsgirêka kurd...

Adil ZOZANÎ 2

## Hasan Cemal û Murat Karayilan



Hevpeyvîna Hasan Cemal ya bi Murat Karayilan re olanvedaneke zêde û balkêş derxist...

Medenî FERHO 2

## Hovîtiya vê sedsalê 'Gorên Tomerî'

Sûcên şer ên artêşa tirk yên li dijî mirovahiyê yek bi yek derdikevin holê. Di lêkolînên li Çiyayê Helkîsê de hatin kirin de li 6 cihan hestiyê mirovan hatin tespîtkirin. Hate destnîşankirin ku hestiyên li çiyayê Helkîsê hatine dîtin aîdî gerîlayên kurd in. Hate ragihandin ku li herêmê gelek çal û şikeft tijî hestiyên mirovan in... *RÛPEL - 3*



## Siyaseta Sûriyeyê kurdan koçber dike

**SEROKÊ** Sendîkaya Cotkaran a Parêzgeha Hesekê Xidir El Hihêsin bi raporekê bal kişand ser xetereyên polîtîkayên Sûriyeyê yên li rojavayê Kurdistanê. Di raporê de tê destnîşankirin ku ji ber xizaniyê bi deh hezaran malbat neçar mane ku cih û warê xwe biterikînin. Bi taybetî li vê parêzgehê û li herêmên din ên Rojava gelek kes êdî terikandinê weke riya tekane dibînin... *RÛPEL - 2*

## Kurdên cezayê îdamê xwarin bûn 13

**REJÎMA** Îranê li bajarê Merîvana rojhilatê Kurdistanê bi boneya alîkarî daye PJAK'ê cezayê îdamê da kurdê bi navê Şakir Bakî. Bakî niha di girtîgeha Sinê de ye. Cezayê îdamê ku ji bo Fesîh Yasemînî hatibû dayîn ji aliyê dozgeriya bilind ve hat qebûlkirin. Hejmara kesên ku bi dozên PKK û PJAK'ê cezayê îdamê girtibûn li Îranê derket 13'an... *RÛPEL - 3*

## Dayik: Bila xwîn êdî neyê rijandin

**DAYIKÊN** leşker û HPG'iyên di pevçûnan de jiyana xwe ji dest dane û HPG'iyên girtî di panela "Dayikên Şer Diaxivin" li Kampûsa Dolapdereyê ya Zanîngehê Bîlgiyê hatin cem hev. Di panela ku moderatoriya wê Rêvebera Şaxa ÎHD'ê ya Stenbolê Seza Mîs Horoz dikir de, dayikan xwest ku li ser vê erdnîgariyê êdî xwîn neyê rijandin û dilê dayikan neêşe... *RÛPEL - 7*

www.arsivakurdi.org

Hişkesalî û polîkayên dewleta Sûriyeyê, li rojavayê Kurdistanê krîza aborî, civakî û siyasî afirand

# Rojavayê Kurdistanê dinale

**Li rojavayê Kurdistanê ji ber hişkesalî û biryarên dewleta Sûriyeyê yên der barê çandiniyê de hilberîn ji sedî 64 kêm bû. Kurdên ku debara xwe bi çandiniyê dikin cih û warên xwe diterikînin**

| **Riroyê XERZÎ** AMED



Serokê Sendîkaya Cotkaran a Parêzgeha Hesekê Xidir El Hihêsin bi rapora ku aşkera kir bal kişand ser xetereyên têkildarî siyaseta dewleta Sûriyeyê yên li rojavayê Kurdistanê. Di raporê de tê destnîşankirin ji ber xizaniyê bi deh hezaran malbat cih û warên xwe diterikînin.

Serokê Sendîkaya Cotkaran a Parêzgeha Hesekê Xidir El Hihêsin bi raporekê bal kişand ser talûkeya mezin. Parêzgeh ji alî çandinî, demografî û civakî ve bi xetereyê re rû bi rû ye.

Di rapora Sendîkayê de tê destnîşankirin ku ev xetereya li Parêzgeha Hesekê ya mîna "Depoya zad a Sûriyeyê' tê binavkirin xetereyeke mezin e û heger nêzîkatiya rayedarên dewletê li hemberî rewşa çandinyê neyê guhertin dê encamên giran derkevin holê. Li gorî hin daneyan hejmara kesên ku neçar mane dev ji gundên xwe bedrin û ber bi Şamê û bajarên din ên wekî Hema, Humis, Laziqiye û Tertûsê ve herin gihaye 200 hezar kesî. Li gorî raporê bi taybetî li vê parezgerê û li herêmen din ên rojavayê Kurdistanê gelek kes êdî terikandina heremê û derketina derveyî welat mîna riya bi tenê dibînin.

### Bi deh hezaran malbat koçber bûn

Hat aşkerakirin ku tenê ji bajarê Qamişlo û derdora wê, di salên dawî de li derdora 30 hezar malbatî koçber bûye. Ji navçeya Şedadê jî li derdora 50 hezar malbatî koç kiriye. Her wiha hejmara rast ya koçberiya ji herêma Cinûb El Red nayê zanîn û piraniya gundên wê herêmê vala bûne.

### Rêjeya xwendekaran ji sedî 16 kêm bû

Li aliyê din Midûriyeta Perwerdeyê ya Parêzgeha Hisîçayê ku hejmara xwendekarên wê digihîje 320 hezar kesî, da xuyakirin ku derdora ji sedî 16 ji xwendekarên dibistanên seretayî, neçar mane ku dest ji dibistanan berdin û bi malbatên xwe re koçber bibin. Di lêkolîna hate kirin de derkete holê ji van kesên koçber bûne ji sedî 75 zarokên wan êdî naçin dibistanê.

### 'Ji rewşê hikûmet berpirs e'

Di raporê de der barê sedemên koçberiyê de ev nirxandin tê kirin: "Ev koçberiya ku ne wekî koçberiya bi darê zorê xuya dike sedema wê hişkesalî û guhertinên xwezayê ne ku mirov li hemberî wan nikare tiştekî bike. Lê hin sedemên din jî hene ku girêdayî hin biryarên nû yên hikûmetê ne. Biryarên girîng ên der barê cureyên çandinyê de û mecbûriyeta çandina hin cureyan de nayên girtin. Ev yek tadeyeke mezin li cotkaran dike û hilberîna wan jî sal bi sal kêmtir dike."

### Hilberîn ji sedî 64 kêm bûye

Li gor agahiyên fermî di hilberîna zad a li herêmê de daketineke mezin heye. Hejmar û îstatîstik rewşa aloz û asta qeryana aborî, civakî û siyasî nîşan didin :

**Sal 2004-2005:** 1 milyon û 300 hezar ton cureyên zad hatin hilberîn.

**Sal 2006-2007:** 800 hezar ton cureyên zad hatin hilberîn.

**Sal 2007-2008:** 465 hezar ton cureyên zad hatin hilberîn.

Ev paşveçûna çandiniyê li gorî Serokê Sendîkaya Cotkaran a Parêzgeha Hesekê, ji ber 2 sedemên bingehîn tê. Sedema yekemîn hişkesalî û kêmbûna baranê ye. Ya duyem jî zêdebûna buhayê petrolê ku bi xwe re lêçûnên çandiniyê jî zêde kiriye.

Hikûmeta Sûriyeyê di vê dema hişkesaliyê de li şûna ku destek û alîkariyê bide cotkaran, kiryarên berevajî dike û bi taybetî jî buhakirina mazotê bandoreke gelekî xirab li ser cotkaran dike û rewşa wan gihaye radeya ku piştî westandinê saleke dawî berhema wan nikaribe wan xwedî bike. Buhabûna petrol, tovê çandiniyê û madeyên din ên di çandiniyê de tên bikaranîn cotkarên Sûriyeyê bê zar kirin û deriyê koçberiyê li piştê vekirî hiştiye, bi taybetî jî li rojavayê Kurdistanê ku li wirê dahata kurdan ji sedî 95 li ser çandiniyê ye.

Bizmar



## Adil Zozanî

a_zozani@hotmail.com

## Aş bi gotinê nagere

Di nava çend rojan de, Serfermandarê Artêşa Tirk Îlker Başbûg, Serokomar Abdullah Gul, Serokwezîr Tayyîp Erdogan û Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay li ser hev bi daxuyaniyên xwe yên der barê pirsgirêka kurd e derketin pêş. Tiştên nû negotin. Lê tiştên ku anîn ziman tên wateya ku dewleta tirk xwe ji bo qonaxeke nû amade dike. Nîqaşa ku îro em dikin divê baş bê zanîn ku yek ji encamên şênber ên hilbijartinên 29'ê adarê ye.

Dewleta tirk, dibîne ku dema bi lezgînî destê xwe negire dê derveyî çareseriya pirsgirêka kurd bimîne. Lewre, 29'ê adarê ji her demê xurttir, riya dîplomasiyê li ber siyaseta kurd vekir. Pêr di quncikê xwe de hevalê me Ahmet Dere ev mijar anî bû ziman. Hewldanên DTP'ê yên di qada dîplomasiyê ji aliyê raya giştî ya navneteweyî ve ji nêz ve tên şopandin.

Her çiqas, daxuyaniyên rayedarên payebilind ên dewleta tirk ji encama derûniya tengasîbûnê biqewimin jî, girîng in. Di qada navneteweyî de santranca dîplomasiyê li ser pirsgirêka kurd tê honandin. Hemleyên tên kirin, 'şerê' dîplomasiyê vedibêjin. Hikûmeta AKP'ê bi revîzyona kabîneyê xwe ji bo van hemleyan amade kir. Tayînkirina Ahmet Davutoglu ya ji bo Wezareta Karên Derve yek îşaretên vê amadabûnê ne. Beramberî vê yekê çûna heyeta KNK'ê ya ji bo başûrê Kurdistanê û şarandina dîplomasiya ji bo Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê jî hamleya siyaseta kurd a qada dîplomasiyê ye. Her wiha amadekariyên ji bo Kongreya Civaka Demokratîk tên kirin jî yek ji pêngavên xwe amadekirina ji bo dema pêş e.

Ango 'şerê' dîplomasiyê her ku diçe germtir dibe. Hevsenga, dîplomasiyê ber bi aliyê me ve girantir e. Siyaseta kurd ligel encamên hilbijartinê hamleyên di cih de kirin. Van hemleyan berî Newroz û hilbijartinan destpêkirin bû. Biryara KCK'ê ya ji bo bêdengîkirina çekan û bersiva gel di sindoqan de dayî hevsenga siyaseta kurd girantir kir.

Biryara bêdengkirina çekan a heta 1'ê hezîranê, dewleta tirk daye zorê. Lewre, beriya niha 5 caran biryarên bi vî rengî hatibûn dayîn. Dewleta tirk her car digot; 'ji ber ku têk çûn agirbestê îlan dikin'. Lê vê carê ev derfetê dewleta tirk nîn e. Siyaseta kurd di lûtkeya herî bilind a hêza xwe de biryareke bi vî rengî daye. Daxuyaniyên rayedarên dewleta tirk ên li ser hev hatine dayîn, her çiqas aşkera nebêjin jî hêviyeke wan ji Tevgera Azadiyê jî tînin ziman. Di serî de gotinên Gul, peyamên ji bo 1'ê hezîranê ne. Peyam ev e: Di 1'ê hezîranê de biryara bêdengîkirina çekan bi dawî nekin.

Lê ev peyam têr nake. Heke rayedarên dewletê yên xwedî vê peyamê samîmî bin divê beriya hilbijartinên hin pêngavên şênber bavêjin.

Tiştên ku heta niha hatine gotin hemû kevn in. Tiştekî nû nehatiye gotin. Heke rayedarên dewleta tirk difikirin ku siyaseta kurd hemleya wan a nû bibînin, divê pêngavên şênber bavêjin.


Diyardeya ji bo konsepta 2005'ê bi tena serê xwe tiştekî îfade nake. Lewre di ser 2005'ê nêzî 4 sal derbas bûn. Di nava van 4 salan de dewleta tirk bi hevkariya Amerîkayê du plansaziyên berfireh ên ji bo tasfiyekirina Tevgera Azadiyê xistin dewreyê.

Zêdetirî 50 êrîşên hewayî û êrîşeke bejayî ya ji bo Heremên Parastinê yên Medyayê pêk anîn. Di Newrozan de jin û zarokên kurd kirin hedef. Li xwepêşandanên girseyî de, komên sivîlan bûn hedefa gulebaranê. Bi hezaran siyasetmedarên kurd hatin binçavkirin. Bisedan hatin girtin. Herî dawî operasyona 14'ê nîsanê ku wekî darbe hatiye navkirin hate pêk anîn.

Divê neyê jibîrkirin ku ev kirin hemû piştî daxuyaniya Erdogan a 12'ê tebaxa 2005'an pêk hatin.

Ji ber vê yekê êdî gotin têr nake. Heke samîmî ne divê gavên pratîk bavêjin. Lewre ev aş bi gotinan nagere.

Tûjik



## Medenî Ferho

medeniferho@hotmail.com

## Hasan Cemal û Murat Karayilan

Hevpeyvîna Hasan Cemal ya bi serokê Konseya Rêvebir a KCK'ê Murat Karayilan re olanvedaneke zêde û balkêş derxist. Çûna Hasan Cemal ya Qendîlê girîng e. Piştî Heypeyvînên bi Murat Karayilan re, nivîskarê rojnameya Hurriyet Ertugrul Ozkok jî, serî li serfermandariya artêşa tirk da ku biçê Îmraliyê.

Îmralî û girtiyê li Îmraliyê, helbet rûmet, mêjî û dilê gelê kurd e. Lê mijara me Qendîl e. Qendîl navenda keşa siyasî û civakî ya paşerojên gelê kurd e. Murat Karayilan jî, yek ji pêşeng û lehengê sereke yê Tevgera Azadiya Kurd e. Artêşa kurd û serfermandariya Artêşa Kurd jî, li Qendîlê ye.

Ez du caran çûme Qendîlê û min 4 cîld pirtûk li ser Qendîlê nivîsîn, 2 cild hatin weşandin. 2 cîld, di rê de ne. Lewra, ji bo pêşerojên azad a gelê kurd, wate û girîngiya Qendîlê dizanim. Min bi vê armancê jî nivîsî.

Di roja îroyîn de, her çiqasî hinek ji rewşenbîr û nivîskarên kurd, wate û giringiya Qendîlê, di "aqîl"tiya xwe de, bi cih ne kiribin jî, wê di paşerojan de ji xeşîmtiya xwe agahdar bibin. Lê tirkan ev wate û giringî baş nas kirine û têgihiştine. Baş fam kirine ku ew ciwan û pêşengên li Qendîlê, ne "sergerde" ne. Ji aliyekî ve mîrateya Kawa, Nehrî, Bedirxan, Ihsan Nûrî, Şêx Seîd û Seyît Rizayan... Ji aliyekî ve mîrateya Saint- Just, Babeûf, Marat, Ropespîerre, Danto... Ji aliyekî ve mîrateya Che Guera, Ho Shî Minh, Lenîn... Ji aliyê din ve mîrateya Denîz Gezmîş, Huseyin Inan, Ibrahîm Kaypakkaya û hwd. ew dimeşînin. Berdewama Şoreşa Frensa, Şoreşa October, Şoreş û berxwedana Wîetnamê û hwd. dimeşînin. Li xaka Kurdistanê û bi piştgiriya gelê kurd, li herêma Rojhilata Navîn, herka çemê dîrokê sererast dikin...

Demekê min û Hasan Cemal, di heman rojnamê de kar kir. Wî baş nas dikim, zîrek e û kevirekî ji rista hişmendiya tirkî ye. Mîna ku di van nivîsên xwe de jî diyar dike, di her nivîsên wî û pirtûkên wî de, mîrateya paşazade û asoyên di pişta xumama dîrokî de winda, xuya dikin. Dixwazê ku vê mîrateyê li hespê demê suwar bike.

Paşazede Hasan Cemal, di nivîsên xwe de, du navên din jî bi kar tîne, gotinên wan yên "çekberdana PKKê" derdixe pêş. Her du mirov; yek ji arêna şerê çekdarî, yek jî ji arêna şerê siyasî reviya ye. Her du jî, di tara bêjingê de xwe fetisandin. Dibêjin: "Dema wê hatiye ku PKKe çekan berbide. Pêvajo ne ya çekdarî ye, û hwd." Yek ji wan navên di tara bêjingê de; ji bo leheng û pêşengên Tevgera Azadîxwaz a Gelê Kurd jî, bicihbûna dewletên Skandînawya pêşniyaz dike. Leheng û pêşengên ku, bi her bosta laşê wan de, birîna berekî, şopa sin û pîjekî heye; layîqî welatên biyanî dike. Sergom!... Balkêş e!..

Ev zihniyeta dijminên sedsalan e, ku leheng, pêşeng û "aqîl"ên kurd bi sergomê şah kirine ye. Zihniyeta teslîmiyetê ye. Zihniyeta bêbawerî û kesayetiya ketî ye. Zihniyeta "ezî" ya belaş û beleheq, ku li ser kursî rûnê ye.

Ev mirovê ku çend caran, "belaş û beleheq" li ser kursiyê temsîliya kurd rûniştiye, di dema Serokê Tevgera Azadiya Kurd Abdullah Ocalan, dîl hate girtin jî, gotinên ji kîloyên xwe mezintir kirin. J ber kursî jî reviya, inirî... Nıha jî kilîda "monîca" xelkê kiriye destên xwe û li Sheraton wiskî vedixwe. Ev gotinên wî ne...

Armanca Hasan Cemal diyar e. Lê armanca van her du mirovên di tara bêjingê, çiye û dixwazin çi bêjin, min fam ne kir. Hasan Cemal jî baş dizane ku her du mirovan jî, mafê gotinê û pêşengiya gelê kurd winda kiriye. Lê car din, dîtinên wan derdixe pêş. Ev jî dide xuya kirin ku Hasan Cemal, bê çiqasî wek rojnamevan nêzîk dibe, hewqasî jî stratejîk nêzîk dibe.

Hasan Cemal jî baş dizane ku, Murat Karayilan û pêşengên din yên Tevgera Azadîxwaz, ji destpêkê heya dawî, di nava dilsoziyê de kar dikin û ji bo gelê kurd, bêyî li berjewendiyên xwe bifikirin, her cûre fedekarî kirine. Yekî ji wan jî, pêlavên Îtalya, gomlekên Îtalya, krawatên Îtalya li xwe ne kirine û li waroşên ewropa li "bîf-stîk, bonfîle, cotlet, shinzel – wien, yan jî li ordekên Pekîn" ne geriya ne. Gerîla çi li xwe kiriye, ew li xwe kirine, çi vexwarine ew vexwarine; di şevên zivistanî de, wek gerîla bataniyek kirine bin xwe, yek jî bi ser xwe dakirine. Gelo guhên hinek kesa nakin çingênî?

Hakemtî û dadmendiya dîrokê heye. Bıla ev neyê ji bîr kirin.

Hasan Cemal baş dizanîbû ku, dema diçe Qendîlê, wê bi kesên ku dîroka Tirkiyê, Kurdistan û herêmê ji bingeh hejandine re biaxive. Baş dizanîbû ku, temsîliya bi deh hezaran şehîdên Têkoşîna Gelê Kurd Qendîl e û cengawerên li Qendîlê ne. Gelo, Hasan Cemal, çima gotinên sergoma leheng û pêşengên Haraketa Kurd bi devê kurdan tîne ziman?

Balkêşiyeke din jî ewe ku Tirk, li ser gotinên Murat Karayilan gelekî rawestiyan û hîna jî radiwestin. Lê nivîskar û rojnamevanên Kurd, qet pêça xwe nedanê. Xwendin û bi xwe re hiştin. Hasan Bildirîcî û Ahmed Aktaş ne di nav de... Gelo binbarî û berpirsiyariya nivîskar û rojnamevanên kurd ne nirxandin û destekkirina Murat Karayilan e?

HAWAR
Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
Bedri ADANIR
Adres:
Kooperatif Mahallesi
Gevran Caddesi 1 Geçit.
Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis
Yenişehir - Diyarbakır
TEL: 0 (412) 229 00 30
Fax: 0 (412) 229 00 39

Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Sefaköy - Küçükçekmece
İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 80
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad. No: 44 Seyhan
Edene
Yayın Türü: Süreli

# Li Helkîsê bermahiyên hovîtiyê

**Sûcên artêşa tirk yên li dijî mirovahiyê yek bi yek derdikevin holê. Di lêkolînên li Çiyayê Helkîsê yê Sasonê hatin kirin de li 6 cihan hestiyên mirovan hatin tespîtkirin.**



Fehmi Korkmaz

Derkete holê ku piraniya hestiyên li Çiyayê Helkîsê yê girêdayî Sasonê hatine dîtin yên gerîlayan in. Hate aşkerakirin ku cenazeyê 10 gerîlayên di sala 1994'an de di şer de jiyana xwe ji dest dan avêtine şikefta li nêzî gundê Timokê.

Di encama hewldanên Baroya Batmanê de roja 11'ê gulanê li herêma di navbera navçeyên Sason û Kozlukê de li çiyalê Helkîsê di encama kolanan de li 6 cihan hestiyên mirovan hatin dîtin. Serokê Baroya ÊlihêYusuf Tanrisever ragihand ku li 6 herêman bi wêneyên hatine kişandin hestiyên mirovan hatine tesbîtkirin. Tanrisever ragihand ku hin cesed bi kinc û pêlavan hatine binaxkirin.

**Cenazeyên gerîlayan**

Li gorî agahiyên hatin bidestxistin, di 10'ê tîrmeha 1994'an de li herêmê di navbera leşkerên qereqolên Helkîs, Herbex, Gox û Timokê û gerîlayan de şerekî dijwar pêk hat. Di şer de van gerîlayan jiyana xwe ji dest da: "Rênas (ji Ferqînê), Şahîn (ji Amedê), Helkîs (Gerîlaya jin ji Êlihê) Firat û Felat (ji Êlihê), Şîlan (ji Botanê), Salihê Goyî û Cengê ji Sasonê, û 2 gerîlayên navên wan nehate tesbîtkirin.

**Tevî kincan avêtin şikeftan**

Şahîdên bûyerê ragihandin ku cenazeyên 10 gerîlayên ku jiyana xwe ji dest dan tevî kincên wan avêtin Şikefta li jorî gundê Timokê.

Şahidekî bûyerê ku nexwest navê xwe bide ragihan ku li herêma Helkîsê gelek cenazeyên gerîlayan bi heman rengî avêtine çal an şikeftan.

Dîsa di sala 1995'an li herêma Mereto di geliyekî de 17 gerîlayan jiyana xwe ji dest da. Di nav wan de Vedatê birayê Vedat Aydin ku fermandarê bêluka gerîlayan jî hebû. Dîsa di nav wan de birayê Fermandarê ARGK'ê Mahsum Korkmaz yê bi navê Egîd, kesê bi navê Azad ku bavê 6 zarokan bû ji gundê Merinaya Êlihê jî hebû.

Di sala 1994'an de li herêma Mereto ji eşîra Alan siyabend û Ahmetê Alan, di sala 1995'an de di şerê li Helkîsê de Doganê Goyî û hevalekî wî di sala 1994'an de li derbasoka di navbera Helkîs û Mereto de gerîlayên bi navên Nîhat û Mahsûm ên ji Êlihê, di şerekî din yê di heman salê de Ferhatê ji Tetwanê û gelek gerîlayên nasnameya wan nehate aşkerakirin jiyana xwe ji dest dan. Hate ragihandin ku cenazeyên hemû gerîlayan bi heman şêwazî li herêmê hatine bicîhkirin an avêtine çal û şikeftan. **ÊLIH / ANF**

## 'Cenazeyê birayê min jî di nav de ye'

Fehmî Korkmaz ku der barê mijarê de lêkolîn pêk anî jî ragihand ku di sala 1995'an de li Çiyayê Helkîsê şer derketiye. Korkmaz ragihand ku birayê wî Veysel Korkmaz (Egîd) jî di nav de hestiyê 29 mirovan hatine dîtin.

Têkildarî mijarê Fehmî Korkmaz ev agahî dan: "Pitî şerê derket em ketin nava hewldanan. Agahî hebûn ku birayê min Veysel jî di şer de jiyana xwe ji dest daye. Lê belê destûr nedan me. Di heman demê de xwişka min Maşallah Kormkaz jî serî li ÎHD'a Amedê dabû. Me jî serî li ÎHD'a Êlihê xist. Lê belê ji van hewldanan tişek derneket."

## Ji bo kesk, sor û zer 5 hezar TL ceza birîn

**AMED**

Bi boneya di mitînga DTP'ê ya 19'ê adarê li navçeya Licê pêk hatî de kesk, sor û zer anîne cem hev 5 hezar TL ceza li zarokê 17 salî Ç. S. hate birîn. DTP'ê bi boneya hilbijartinên 29'ê Adarê di 19'ê adarê de li navçeya Licê ya Amedê mitîng li darxistibû. Bi boneya di mitîngê de rengên kesk, sor û zer anîne cem hev û "propagandaya rêxistinê kiriye" doz li ciwanê 17 salî Ç. S. hate vekirin. Di encama doza li Dadgeha Sulh Ceza ya Licê de bi hinceta, "propagandaya rêxistinê kiriye" 5 hezar TL birî.

## Operasyon berfireh dibe

**DÊRSIM**

Operasyona artêşa tirk ya li Dêrsimê li hemberî PKK'ê daye destpêkirin bi berfirehî didome. Li gorî agahiyên ku hatin bidestxistin operasyon li hemberî endamên PKK'ê li Kizilmescîta navçeya Pilûmûrê, Dokuzkayalar, Ramazan û Sarikayaya navçeya Nazimiyeyê dabû destpêkirin. Hate zanîn ku operasyon ber bi çolterên Yedîsû û Yayladereyê ve berfireh dibe. Hate zanîn ku cih bi cih pevçûn çêdibin. Her wiha gelek leşker û muhîmatên leşkerî jî sewqî herêmê tên kirin.

## Di êrîşa Kerkûkê de 8 kes hatin kuştin

**KERKÛK**

Bajarê Kerkûka başûrê Kurdistanê bi wesayîta teqemenî lê barkirî êrîş pêk hat û di ancama teqînê de 8 kesan jiyana xwe ji dest da. Berdevkê Polîs Serhat Kadir diyar kir ku êrîş li hemberî polîsan pêk hatiye û di ancamê de 5 jê polîs bi giştî 8 kasan jiyana xwe ji dest daye. Hat gotin ku 11 kes jî birîndar bûne. Kadir destnîşan kir ku di heman deqeyan de teqîneke din jî li Kerkûkê pêk hat lê ji ber teqînê tu kes nemir û birîndar nebû. Rojek beriya vê jî teqînek li ber mizgefta Edîlê pêk hat û 2 kesan jiyana xwe ji dest da û 9 kes jî birîndar bûn.

## Leşkerê amerîkî 5 hevalên xwe kuşt

**BEXDA**

Leşkerekî Amerîkayê ku li paytexta Iraqê Bexdayê peywir dike 5 hevalên xwe yên leşker kuştin û li ser mijarê rayedarekî Pentagonê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de hat gotin ku bûyer li baregeha Amerîkayê ya bi navê 'Camp Liberty' qewimiye û li baregeha leşkerî ya paytexta Iraq Bexdayê leşkerekî amerîkî 5 hevalên xwe yên leşker kuştin. Berdevkê leşkerî yê Amerîkayê diyar kir ku leşkerê ku hevalên xwe kuştin hatiye binçavkirin. Ev wek sendroma nav leşkerên Amerîkayê tê şîrovekirin.

## CPJ'ê rewşa rojnamegeran ji Barzanî pirsî

**I SERBAZ SIYAMEND** - HEWLÊR

Rêveberê Komîteya Parastina Rojnamevanan (CPJ) Col Saymen têkildarî zordariyên li ser rojnamegerên Herêma Federal a Kurdistanê nameyek ji Serokê Herêmê Mesût Barzanî re şand. Saymen xwest ku bersiva wan bê dayîn û dawî li kuştin û gefxwarinên li ser rojnamegeran bê.

Seyman di nameya ji Barzanî re şand de got ku li Herêma Federal a Kurdistanê rojnamevan dibin gef, zext û zordariyê de dixebitin û wiha pê de diçe: "Her çiqas li herêmê pêngavên baş avêtine, zagona rojnamegeriyê ji parlamentoyê derxistine, binçavkirin û girtina rojnamegeran qedexe kirin jî di pratîkê de pêkanînên neyînî hene. Rojnamevan tên girtin û rayedarên herêmê doz li gelek rojnamegeran vekirine. Piraniya van dozan jî ne li gorî zagona nû ye li gorî zagona sala 1969'an e. Li gorî daneyên Sendîkaya Rojnamegerên Kurdistanê niha rayedarên hikûmetê û gelek kesên din li 23 rojnamegeran doz vekirine."

Di nameyê de Saymen diyar dike ku tenê di 2009'an de ji hêla rayedarên hikûmetê ve doz li 55 rojnamegeran hatine vekirin û wiha domand: "Hemû rojnameger jî li gorî zagona 1969'an tên darizandin. Divê rojnameger bawer bin ku ji hêla Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê ve tên parastin, da ku karibin xebata cemaweriyê bikin. Em wekî CPJ dixwazin hûn di vî warî de lêkolînekê bidin destpêkirin ."

## Îran kurdan bi îdamê tehdît dike

Rejima Îranê li bajarê Merîvana rojhilatê Kurdistanê bi boneya alîkarî daye PJAK'ê cezayê îdamê da kurdê bi navê Şakir Bakî. Her wiha cezayê îdamê ku ji bo Fesîh Yasemînî hatibû dayîn ji aliyê dozgeriya bilind ve hat qebûlkirin. Hejmara kesên ku bi dozên PKK û PJAK'ê cezayê îdamê girtine derket 13'an.

Li gorî agahiyên ku hatin bidestxistin ji bo cezayê 30 salan ku Şakir Bakiyê li Wanê ji dayik bûye û 2 sal in di girtîgeha Sineyê de dimîne, îtîraz hat kirin. Dozgeriya Eyaleta Kurdistanê îtiraz li ber çavan girt û vê carê jî cezayê îdamê da Şakir Bakî. Bakî li Merîvanê dema xebatên siyasî dikir ji aliyê hêzên dewletê ve hatibû girtin û niha di girtîgeha Sineyê de girtî ye.

Her wiha cezayê îdamê ku Fesîh Yasemîniyê ku di girtîgeha Xoyê de dimîne hatibû birîn ji aliyê dozgeriya bilind ve careke din hate erêkirin. Di sala 2007'an de bi boneya ku alîkarî dane PJAK'ê Fesîh Yasemînî, bavê wî Husên Yasemînî, Rustem Arkiya û Fatîh Rezazade li bajarê Makoyê hatibûn girtin. Dozgeriya Şoreşê cezayê îdamê dabû Yasemînî û Arkiya û cezayê 15 salan dabû Fatîh Rezazade û cezayê 2 salan jî dabû Husên Yasemînî.

Bi cezayê îdamê ku li Şakîr Bakî hatiye birdîn re hejmara kesên ku bi dozên PKK û PJAK'ê cezayê îdamê girtine derket 13'an. Di sala 2007'an de mîlîtanê PJAK'ê Hasan Hîkmet Demîr piştî îşkenceyeke giran di rewşeke birîndar de hatibû îdamkirin. Di girtîgehên Îranê de di nav kesên cezayê îdamê girtine de 5 mamoste û rojnamegerek jî cih digirin. Navên kesên cezayê îdamê girtine ev in; Mamosteyên kurd: Ferzad Kemanger, Ferhad Wekili û Eli Heyderiyan; Xwendekar: Hebibulla Letifi; Girtiyên doza PJAK'ê yên din; Îhsan Fetahiyan, Fesih Yasemînî, Rustem Arkiya, Zeynep Celaliyan, Şerko Maarfi, Ferhat Çaliş, Ramazan Ahmet, Enwer Rostemî û Şakîr Bakî. **SINE / ANF**

## Jinên DTP'î çûn Zankirtê



Gelek jinên endamên saziyên cuda bi armanca piştgiriyê çûn serdana gundê Zangirta Mêrdînê ku di encama komkujiya pêk hatî de 44 kesan jiyana xwe ji dest dabû.

Jinên endamên KESK, DOKH, Malên Gel, Wexfa Hevgiriya Jinan a Enqereyê, TMMOB, Konseya Navendî ya Yekîtiya Tabîbên Tirk, Selîs, DÎKASUM, Mala Jinan a Kardelenê, Kooperatîfa Jinan a Baglare, Endama Meclîsa Aştiyê ya Tirkiyeyê Yuksel Mutlu, Şaredara Nisêbînê Ayşe Gokkan, Şaredara Baglarê Yuksel Baran û gelek kesên din bi armanca piştgiriyê çûn serdana jinên gundê Zankirtê. Jinan pêşî goristana 39 kes lê hatine veşartin ziyaret kir. Ji vir jî jin derbasî konê sersaxiyê bûn. Endama Meclîsa Aştiyê ya Tirkiyeyê Yuksel Mutlu li vir axaftinek kir û bal kişand ser gotina Berdevkê Hikûmetê Cemîl Çîçek a wekî, "Dibe hind caran di nav pergalê de xeletî çêbin" û wiha axivî: "Gelo Çîçek ji bo vê komkujiyê û qetilkirina jinên ducanî çi dibêje? Di destê saziyên mafên mirovan de agahî hene. Cerdevan ketine nav gelek karên derzgonî. Dê tedbîrên çawa bên girtin? Divê hikûmet der barê mijarê de xebatan bike. Em meraq dikin ev hovîtiya hatiye vê astê çima nehat astenkirin. Ji ber ku cerdevan li herêmê nûnertiya bêdadiyê dikin. Pişta xwe dane dewletê û tiştê dixwazin dikin, dewlet jî wan diparêze."

Piştî axaftinê jinan demekê bi malbatan re sohbet kir û ji gund veqetiyan. **MÊRDÎN**

www.arsivakurd.org

# Mîhrîcana Govenda Kurdî li Frankfurtê ye

**I Şahîn BOZLAR** - FRANKFURT

22'yemîn Mîhrîcana Govenda Kurdî îsal li Frankfurtê tê lidarxistin. Mîhrîcana ku 31'ê gulanê dê dest pê bike ji bo hunermendê kurd Hidir Çelîk ku par di qezaya trafîkê de jiyana xwe ji dest dabû, hatiye diyarîkirin.

Mîhrîcana Govenda Kurdî 21 sal berê cara yekem li bajarê Bonna Almanyayê hate lidarxistin. Mîhrîcana îsal li bajarê Frankfurtê ji aliyê 'Multikultureller Freundschaftsverein Frankfurt e.V' û 'Baran Kulturhaus e.V' ve tê lidarxistin. Mîhrîcan di 30'ê gulanê roja şemiyê saet di 17:00'an de bi meşa ku weke kevneşopî her sal pêk tê de dê bê destpêkirin. Hemû komên beşdarî mîhrîcanê dibin dê cilên neteweyî li xwe bikin û bi pankarta 'Çanda me nasnameya me ye' bimeşin. Di meşê de, bûka ku li ser hespê ye dê li pêşiya kortejê cih bigire. Vekirina mîhrîcanê koma saz a ji şagirtên Hidir Çelîk pêk tê dê bike. Piştre pêşbirka govendên gelêrî dê dest pê bike. Di bernameyê de komên govendê yên gelêrî yên zarokan Hozan Şemdîn, Vengê Sodirî û komên biyanî cih bigirin. Piştî pêşandana sînevîzyonê dê kesên ketin dereceyê xelatên xwe wergirin.

**Li hêviya serlêdanan in**

Li ser navê komîteya amadekar Murat Kizilboga diyar kir ku amadekariyên mîhrîcanê temam bûne, li benda mîhrîcanê û dîroka dawî ya serlêdanê ne. Kizilboga, da zanîn ku piştî serlêdanan de herî kêm 20 govendên gelêrî beşdarî mîhrîcanê bibin. Kizilboga, ji bo beşdarbûneke zêde çêbe bangî hemû komên govendên gelêrî dike ku beşdarî mîhrîcanê bibin. Kizilboga, ragihand ku armanca wan ew e ku li çanda xwe xwedî derkevin. Kizilboga, diyar kir ku juriya mîhrîcanê ji Hozan Şemdîn, Merdan (Baran Kultur Haus), Yasîn Boyraz (Baran Kultur Haus), Ozgur Taş (Awusturya) û Funda Kizilateş pêk tê.

**Krîterên beşdarbûna mîhrîcanê**

Ji bo her komek performansa xwe nîşan bide herî kêm 8 herî zêde jî 12 deqîqe dem tê nasîn. Komên ku zêdeyî van deqîqeyan be pûanên wan tê daxistin. Hejmara komên beşdarî mîhrîcanê dibin divê ji 10 kesan ne kêmtir û temenê wan zêdetirî 13 salî be. Komîteya amadekar ji bo komên hejmara wan 8 kes bin dê toleransê nîşan bide. Lê divê ev kom destpêkê komîteya amadekar agahdar bikin. Kesên beşdarî mîhrîcanê dibin, divê li gorî komîteya amadekar tevbigerin. Heke ne wisa be dê pûanên wan bê daxistin. Komîteya amadekar qaîdeyên kostum û makyajê de bi 5 xalan diyar kirine. Ev ji wiha ne: "Kostum li gorî herêma jê hatine bê amadekirin, di girêdayîna kostum de baldar bin. Kostumên herêmê li gorî orjînalbûna xwe bin, rast li xwe bikin û parçeyên kostumên herêmên din bi kar neyînin. Xişran di cih de bi kar bînin." Makyaj jî hine, deq û kil dê bê bikaranîn, ji bilî vê tu makyajên din dê neyê bikaranîn.

**Serlêdan heta 15'ê gulanê ye**

Serlêdana mîhrîcanê herî dawî heta 15'ê gulanê ye. Her wiha di mîhrîcanê de xelatên taybet jî dê bê dayîn. Komên ku kostumên orjînal bi motîfên kurdî hatibin xemilandin dê xelata taybet ji bo wan bê dayîn. Xelateke din jî dosyayên lêkolînê yên der barê folklora kurdî de hatine amadekirin dê bê dayîn. Krîterên ji bo dosyayê wiha ne: 1- Dosyaya tê amadekirin divê di navbera 8 û 20 rûpelan de be (Ji bilî rûpela destpêkê û çavkaniyan). 2- Dosya divê der barê folklora kurdî de be. Mînak; danasîna herêmê, kostum, muzîk, lîstik, dengbêjî, dîrok, efsane hwd. 3- Çavkanî di rûpela dawî de bêne destnîşankirin. Di pirtûkan de; nav, weşanxane, rûpel, dîroka çapkirinê. Di qadên elektronîk de navnîşana malperê, di hevpeyvîn an jî kes bêne nîşandan nav û telefon. Kesên dixwazin lêkolînê bikin dikarin kîtekîtiyên mijarê ji komîteya amadekar û navnîşanên e-mailê bigirin.

Navnîşan: Komîteya Amadekar a Mîhrîcanê Z.Hd. Herrn Mustafa fiahin DB ServiceStor Frankfurt West Kasselerstr. 20 60486 Frankfurt am Main.

**Telefonên têkildariyê:**
**Murat Kızılboga Tel:** 0049 (0) 1522 294 18 60/ 0049 (0) 1522 596 83 75 **Mustafa Şahin Tel:** 0049 (0) 1623 68 00 99/ 0049 (0) 1577 144 46 59.
**Zeynep Tel:** 0049 (0) 1742 82 12 97.
**E mail:** *mihrican.gowend@hotmail.com*




# Komeke cuda Teatrapotamya

## Teatrapotamya 10 sal in li çiyayên Kurdistanê karên xwe yên hunerî dimeşîne. Koma şanoyê Teatrapotamya bi pêşengiya hunermend Gafur Dogan û Erdogan Kahraman hatiye avakirin. Teatrapotamya bi du lîstikên nû îsal sezona şanoyê vekir

**I Ekîn SÎVAS** - QENDÎL / ANF

Teatrapotamya ku bi pêşengiya hunermend Gafur Dogan (Hêvî), Erdogan Kahraman (Yekta) û gelek hunermendên din ku di Têkoşîna Azadiya Kurd de jiyana xwe ji dest dan, hate avakirin, 10 sal in xebatên xwe dimeşîne. Koma Teatrapotamya bi lîstikên nû kete dema nû.

Endamên Teatrapotamya bi lîstika xwe ya monolog a bi navê 'Hêviyek da' ku di 27'ê adarê de lîstibûn, dest bi dema xwe ya nû kir. Di vê dîrokê de hem hunermend Yekta jiyana xwe ji dest dabû û hem jî rojbûna hunermend Hêvî bû. Her wiha di vê dîrokê de Roja Şanoyê ya Cîhanê tê pîrozkirin.

**Lêpirsîna jiyan û mirinê**

Koma Teatrapotamya bi vê lîstika xwe di bin banê gerîlayan de li Qadên Parastinê yên Medyayê li gelek deran derkete ser dikê. Di nava du mehan de bi hezaran gerîlayan lîstik temaşe kirin û her wiha lîstikê eleqeyeke germ dît.

Derhênerê lîstikê Jînda Asmen e û lîstik ji aliyê Dîcle Suruç û Ekîn Ronî Koçgirî ve hatiye nivîsandin. Daxistan Koçer jî di lîstikê de dilîze. Di lîstikê de yek kes dilîze û jiyana dengbêjê kal Apê Îsa vedibêje. Apê Îsa di navbera park û goristanê de nobedariyê dike. Lîstik lêpirsîna navbera jiyan û mirina Apê Îsa vedibêje.

Lîstik di navbera zarokatî û extiyariya dengbêj de diçe û tê. Her wiha taybetiya li ser jiyana wî ya gund û bajar jî di lîstikê de tê nîqaşkirin. Li goristanê gulek dibe hevalê Apê Îsa û li parkê jî hêlekanek dibe hevalê wî. Di lîstikê de jiyana komunal a gund û jiyana bajar a kapîtalîst gelek caran hevrû dibin. Lîstika bi navê 'Hêviyek da' bi kurdî tê pêşkêşkirin. Lîstik ji aliyê gerîlayan ve tê lîstin û ji bo Erdogan Kahraman û Gafur Dogan hatiye amadekirin.

**Beşa 'Rû' ya sêyemîn**

Lîstikeke din a bi navê 'Rû' ku ew jî ji aliyê endamên Teatrapotamya ve tê lîstin, berê ji aliyê Ozlem Arzeba û Gafur Dogan ve hatibû nivîsandin. Lîstika nû ya ku gerîla nivîsandiye, tiştên komîk yên ku di jiyana gerîlayan de hatine jiyîn vedibêje. Lîstik li bingeheke felsefîk hatiye rûniştandin û her wiha dema ku dikenîne, dide fikirandin jî. Lîstik nîqaşa pêvajoyekê vedibêje. Nîqaş di navbera çar gerîlayan de derbas dibe. Derhênera lîstikê jî Dîcle Suruç e.

**Azadî tune be, estetîk jî tune ye**

Endamên Teatrapotamya diyar kirin eger azadiya kesekî tune be estetîka wî jî tune ye. Endamên Teatrapotamya hunera xwe wekî çalakiyeke azadiyê îcra dikin. Endamên Teatrapotamya destnîşan dikin dê li hemû deverên Kurdistanê şoreşgeriya hunerê biafirînin û her wiha ji bo huner û azadiyê bang li ciwanên Kurdistanê kirin.


*Koma şanoyê Teatrapotamya ku bi pêşengtiya Gafur Dogan û Erdogan Kahraman hate avakirin û 10 sal in xebatên xwe li çiyê dimeşîne.*

# Ji duh heta îro Mîhrîcana Cannesê

Mîhrîcana Fîlman a Cannesê îsal salvegera xwe ya 62'emîn pîroz dike. Mîhrîcan 61 sal in bênavber berdewam dike. Destpêka mîhrîcanê di bin fikra faşîzma Îtalya û Almanyayê, ku wekî ahtapotekî Ewropa dorpêç kiribû, derket holê. Li dijî vê yekê Fransayê temelê Mîhrîcana Fîlman a Cannesê avêt. Mîhrîcana Fîlman a Cannesê îro di cîhanê de di nav sê mîhrîcanên herî baş de cih digire. Bi kurtasî navenda sînemaya cîhanê ye. Cannes beriya mîhrîcanê angd beriya 200 salan gundekî biçûk bû. Lê di sala 1938'an de qedera Cannesê guherî.

**Ji ber şer di 1946'an de dest pê kir**

Piştî ku faşîzma Almanya û Îtalyayê li Mostrayê mudaxaleyê hilbijartina fîlmên Venîceyê kir û Cannes bi carekê de bû mekanê sînemahezan. Li dijî vê biryara îktîdarên faşîst, Wezîrê Perwerdehiyê yê Fransayê Jean Zay kete nava fikaran û bi pêşniyara Philippe Erlanger, biryar da ku li Cannesê mîhrîcaneke navneteweyî bidin destpêkirin. Plan kirin ku mîhrîcanê di yekê îlona 1939'an de bidin destpêkirin. Her wiha mucîdê sînemayê Louis Lumiere anîn ser serokatiya mîhrîcanê. Lê plana wan ji ber şer pêk nehat. Mîhrîcan ji ber şer heta 1946'an paşve xistin û di 1946'an de di navbera 20 îlon û 5'ê cotmehê de hate lidarxistin.

**Di 1968'an de ji ber grevan nîvco ma**

Mîhrîcan heta 1968'an bê navber û bê pisrgirêk berdewam kir, lê divê salê de dîsa rastî astengiyan hat. Mîhrîcan di 19'ê gulanê de ji ber grevên mezin yên li Fransayê rastî qutbûnekê tê. Serokê juriya mîhrîcanê Louîs Malle û derhênerên wekî François Truffaut, Claude Berrî, Jean Gabriel Albicocco, Claude Lelouch, Roman Planski û Jean-Luc Godard salona mezin ya Palaisê dikin bin destê xwe û ji bo ku piştgiriyê bidin grevê, sînemayê didin sekinandin. Ev bûyer di dîroka mîhrîcanê de deng da û kete nava bûyerên herî girîng.

**Di Cannesê de navê kurdan jî derbas bû**

Bi qesra mîhrîcanê re nêzî 30 salonên mîhrîcanê hene. Di sala 1983'an de di deh rojan de bi sedan pêşangeh pêk hatin. Mîhrîcana Fîlman a Cannesê navê kurdan cara yekemîn bi Yilmaz Guney re bihîst. Mîhrîcan her sal ji aliyê 40 hezar kesî ve temaşekirin.

## Ji 1946'an heta niha xelatên 'Palmiyeya Zêrîn'

✓ 1946 Antoine et Antoinette (Jacques Becker)
✓ 1947 La bataille du rail (Rene Clement)
✓ 1949 The Third Man (Carol Reed)
✓ 1951 Miracolo a Milano (Vittorio de Sica) û Froken Julîe (Alf Sjoberg)
✓ 1952 The Tragedy of Othello: The Moor of Vence (Orson Welles) û Due soldi di speranza (Renato Castellani)
✓ 1953 Le Salaire de la peur (Henri Georges Clouzot)
✓ 1954 Jigokumon (Teinosuke Kinugasa)
✓ 1955 Marty (Delbert Man)
✓ 1956 Le Monde du silence (Louis Malle & Jacques Yves Cousteau)
✓ 1957 Friendly Persuasion (Wilîam Wyler)
✓ 1958 Letyat zhuravli / Quand passent les cigogner (Mikhail Kalatozov)
✓ 1959 Orfeu Negro (Marcel Camus)
✓ 1960 La Dolce vita(Federico Fellini)
✓ 1961 Viridiana (Luis Bunuel) û Une ausi longue absence (Henri Colpe)
✓ 1962 O Pagador de Promessas (Anselmo Duarte)
✓ 1963 Il Gattopardo / The Leopard - Leopar (Luchino Visconti)
✓ 1964 Les Parapluies de Cherbourg - Şemsiyê Cherbourg (Jacques Demy)
✓ 1965 The Knack ...and How to Get It (Richard Lester)
✓ 1966 Un homme et une femme (Claude Lelouch) û Signore & signori (Pietro Germi)
✓ 1967 Blowup (Mîchelangelo Antonîonî)
✓ 1969 If.... (Lindsay Anderson)
✓ 1970 MASH (Robert Altman)
✓ 1971 The Go-Between (Joseph Losey)
✓ 1972 La Classe operaîa va în paradîso (Elîo Petrî) û Il Caso Matteî (Francesco Rosî)
✓ 1973 Scarecrow (Jerry Schatzberg) û The Hireling (Alan Bridges)
✓ 1974 The Conversatîon (Francis Ford Coppola)
✓ 1975 Chronique des annêes de braise (Mohammed Lokhdar Hamîna)
✓ 1976 Taxi Driver (Martîn Scorsese)
✓ 1977 Padre padrone (Birayen Taviani)
✓ 1978 L' Albero degli zoccoli (Ermanno Olmi)
✓ 1979 Die Blechtrommel (Volker Schlondorff) û Apocalypse Now (Francis Ford Coppola)
✓ 1980 Kagemusha - Dublor / (Akîra Kurosawa) û All That Jazz (Bob Fosse)
✓ 1981 Czlowiek zelaza (Andrzej Wajda)
✓ 1982 Rê (Yilmaz Guney û Şerif Goren) û The Missing (Costa-Gavras)
✓ 1983 Narayama bushiko (Shohei Imamura)
✓ 1984 Parîs, Texas (Wim Wenders)
✓ 1985 Otac na sluzbenom putu (Emîr Kusturîca)
✓ 1986 The Mission (Roland Joffe)
✓ 1987 Sous le soleil de Satan (Maurice Pialat)
✓ 1988 Pelle erobreren (Bille August)
✓ 1989 Sex, Lies, and Videotape (Steven Soderbergh)
✓ 1990 Wild at Heart (Davîd Lynch)
✓ 1991 Barton Fink (Joel Coen)
✓ 1992 Den Goda viljan / The Best Intentions (Bille August)
✓ 1993 The Piano (Jane Campion)û Ba wang bie ji (Kaige Chen)
✓ 1994 Pulp Fiction (Quentin Tarantino)
✓ 1995 Underground (Emir Kusturica)
✓ 1996 Secrets & Lies (Mike Leigh)
✓ 1997 Unagi / L'anguille – (Shohei Imamura) û Ta'm e guilass – (Abbas Kiarostami)
✓ 1998 Mia aioniotita kai mia mera / Eternity and a Day (Theo Angelopoulos)
✓ 1999 Rosetta (Luc û Pierre Dardenne)
✓ 2000 Dancer in the Dark (Lars von Trier)
✓ 2001 La Stanza del figlio (Nanni Moretti)
✓ 2002 The Pianist (Roman Polanski)
✓ 2003 Elephant (Gus Van Sant)
✓ 2004 Fahrenheit 9/11 (Michael Moore)
✓ 2005 L' Enfant
✓ 2006 The Wind That Shakes the Barley
✓ 2007 4 Months 3 weeks and 2 days- (Chirstian Mumgiu)
✓ 2008 Entre les Murs (Laurent Cantet)



Hawar
13 Gulan 2009 Çarşem

## Depresyon mirovan qelew dike

Depresyon zirarên mezin dide tenduristiya mirovan û herî zêde jî dibe sedema xemgîniyê. Lê zirara ku depresyon dide mirovan ne tenê ev e. Pispor dibêjin ku depresyon dibe sedema qelewbûnê jî. Di encama lêkolînekê de derket holê ku depresyon dike ku laşê mirovan zêde don bigire. Bi taybetî jî pişt û lebatên mirovan ên hundirin zêde don digirin. Ev don ji nexweşiya diyabetê re jî rê vedikin. Ji ber vê yekê jî pispor dibêjin ku divê welatî xwe ji stresê biparêzin. **BONN**

# Debara xwe bi firotina pincarê dikin



### Ligel tirsa operasyon û madeyen teqemeniyê jinên colemêrgî her roj berê xwe didin çiya û zozanan û pincarê berhev dikin. Colemêrgî pincarê difiroşin û debara xwe pê dikin



Li Kurdistanê bi hatina biharê re mezin biçûk her kes derdikeve çiya û zozanan û pincarê berhev dikin. Li gundê Morî yê bi ser Bajêrgeha Gevera Colemêrgê bi taybetî jî jin bi berhevkirina pincarê debara malbatên xwe dikin. Jinên ku pincarê berhev dikin herî zêde ji operasyonan ditirsin.

Li gundê Moriyê bi hatina biharê re pincarên weke luş, mende, kelîş, tirşik, kirvar (kereng), istirik, çiriş, elo, hingêdan, pungê siyabo dibin çavkaniya debara malbatan. Jinên ku serê sibehê derdikevin çiya û zozanan ji ber berhevkirina pincaran diwestin. Jinên pincarçin wê demê navberê didin karê xwe û bi govend û stranan bêhna xwe vedidin. Jinên pincarçin heta êvarê pincarê berhev dikin. Ji wan pincaran hinekî ji bo zivistanê dixin depoyê. Hinekî jî dibin Bajêrgeh û Geverê difiroşin.

**Ji operasyon û mayinan ditirsin**

Jinên pincarçin dema ku pincarê berhev dikin ditirsin jî. Ji ber ku wan Hanîfe Duman (50) a ku par dema pincar berhev dikir pê li mayinê kiribû û jiyana xwe ji dest dabû, ji bir nekiriye. Ji ber vê yekê tirsa wan a herî mezir operasyon û madeyên teqemeniyê ne. Lê ligel vê jî pincarê berhev dikin.

**Debara malbata xwe dikin**

Ji jinên ku pincar berhev dikin Nadiye Altekîn, anî ziman ku demeke kin jî be bi çinîna pincarê debara mala xwe dike. Aytekîn, destnîşan kir ku li çiya çinîna pincar coşê bi mirovan re çêdike û wiha domand: "Diltengiya me ew e ku li herêmê oparasyon û pevçûn didomin. Ji ber ku li gelek cihan mayîn hene em bi tirs pincar berhev dikin."

Jina bi navê Naîme Sefali ku hevserê wê betal e, diyar kir ku debara mala xwe bi çinîna pincarê ji kontarên çiyayan dike. Sefali, anî ziman ku bi pincarê ku diçine gelek cureyên xwarinê çêdike.

Jina bi navê Leyla Altek jî daxund ku operayon tune bûna dê pincar debara gund ya salekê derxista û ev tişt gotin: "Bi çinîna pincarê di 20 rojan de ez 2 hezar TL qezenc dikim. Wiha alîkarî abora mala xwe dibim. Altek, anî ziman ku ne ji şer û pevçûnan be wê bi şevan jî li kontarên çiyayan bimîne û wiha pê de çû: "Ji ber tirsa teqînan em li tevahî herêmê newêrin bigerin. Bi şevê em newêrin li çiyayan bimînin. Ku ne ji şer bûya wê çinîna pincar bibûya çavkaniya debara gund ya salekê."

**Dema leşker hebin naçin**

Di nav jinan de keça bi navê Nuran Sefali ya 12 salî jî heye û ji ber çinîna pincarê navber daye dibistana xwe. Sefali ku bi dayika xwe re diçe çinînê wiha got: "Dema ku em diçin çandiniyê em rastî leşkeran tên û ev yek tirsê bi min re çêdike. Dema ku em zanibin leşker li herêmê ne em naçin pincaran." **COLEMÊRG / DÎHA**

## Sezona mêşan dest pê kir

Naçeya Elkê ya Şirnexê ku bi xweza û şînahiya xwe balê dikişîne, ji bo xwedîkirina mêşan devereke dewlemend e. Li Elkê ku bi hingivê xwe yê bi kalîte tê zanîn, sezona mêşan û hilberîna hingiv dest pê kir.

Li navçeya Elkê ku bi xwezaya xwe ya xweşik balê dikişîne, piraniya welatiyên li vir bi xwedîkirina mêşan re eleqedar dibin. Li navçeyê ji ber barîna berfê ya zêde, welatî di meha çileyê de gelek zahmet dikişînin. Navçe bi germbûna hewayê re vedigere bihûştê. Elkê bi mezrayên xwe û bi xwezaya xwe bala her kesî dikşîne û ji bo sewalkariyê jî cihekî dewlemend e. Wekî her sal îsal jî welatiyan bi mêşên xwe berê xwe da navçeyê. Welatiyên ku sezona mêşan li vir diqedînin, hingivê ku bi dest dixin li bazarên cuda difiroşin. Welatî di kalîteya hingiv de gelekî bi îdia ne û dixwazin bazara firotina hingiv hîn berfirehtir bibe. Welatiyên li navendê û li gundan ku bi karê mêşan re mijûl dibin ji ber tu karê din li ba wan tune ye karê mêşan dikin. Welatiyên ku bi salan e bi karê mêşan debara xwe dikin, anîn ziman ku herêma Şirnexê ji bo karê mêşan cihê herî baş e. **ŞIRNEX**



## Hemû cêwî ne

Li Hindistanê gundek bi taybetiya xwe bala her kesî dikêşe û mirovan matmayî dihêle. Li gundê bi navê Keralayê zarokên ku ji dayik dibin hemû cêwî ne. Li gund 2 hezar malbat dijîn. Hate ragihandin ku bijîşk ji bo ku sedema vê yekê fêm bikin lêkolînan dikin. Lê heta niha negihîştine encamekê. **DELHÎ**

## Riyên navçeyê tên çêkirin

Li navçeya Patnosa Agiriyê ekîbên şaredariyê ji bo firehkirina riyan dest bi xebatan kir. Şaredarê Patnosê Yusuf Yilmaz piştî ku di hilbijartinên 29'ê adarê de hat ser kar dest bi xebatên xwe kir.

Şaredariya navçeya Patnosê di serî de dixwaze pirsgirêka binesaziyê ya ku pirsgirêka herî girîng a navçeyê ye çareser bike.

Di vê çarçoveyê de li navenda navçeyê rê tên firehkirin. Şaredar Yilmaz jî xebatan kontrol dike. Yilmaz got ku ji ber rê pir teng in welatî pir zehmetî dikêşin, ew ê di serî de 500 metre rê vekin û wiha axivî: "Li navçeyê ji ber pirsgirêkên binesaziyê gelek tengasî tê kişandin. Bi taybetî jî li hin kolanan welatî pirsgirêkên cidî dijîn. Ji bo ku ev pirsgirêk bên çareserkirin me dest bi xebatê kir." **AGIRÎ**



## Li Mêrsînê kebabpêjeke jin

Li Mêrsînê kebabpêja jin a tekane Halîmê Tîmur (40) e. Halîme Tîmur bi kebab û tantuniya çêdike bi nav û deng e.

Halîme Tîmura ku dayika 6 zarokan e piştî ku hevserê wê tê girtin dest bi kebabpêjiyê kiriye. Tîmur diyar kir ku dema ku dest bi vî karî kiriye ji ber nasnameya xwe ya jinê rastî nêzikatiyên ne baş hatiye. Lê piştre ev nêrîn hatiye guhertin. Tîmur got ku hevserê wê 2 sal in ji girtîgehê derketiye û wiha axivî: "Piştî ku hevserê min ji girtîgehê derket, dît ku ez karê xwe dikim, tiştek negot. Tenê alîkarî da min." Tîmur diyar kir ku di nava demê de kebaba ku ew çêdike ji aliyê her kesî ve hatiye ecibandin û her kesî qala wê kiriye. Esnafên der û dorê sîparîşê didin wê. Tîmur got ku herî zêde rojên betlanayê karê wê baş e û wiha berdewam kir: "Cejn û rojên betlaneyê ji bo min nîn in. Bi taybetî wan rojan karê me zêde ye. Ji ber vê yekê rojên betlane û cejnê jî em dixebitin." Di dawiya axaftina xwe de Tîmur got heke astengiyên li peşiya jinan bên rakirin, ew ê her tiştî bikin. **MÊRSÎN**